

BELGEYA RAGEHANDINÊ

Ji bo vaksînekirina li dijî COVID-19 (**Nexweşiya Vîrûsa Korona 2019**)
(vaksînelêdana seretayî û vaksînelêdana bihêzker)

- Bi vaksînên mRNA –

(Comirnaty® 10 µg û 30 µg ji BioNTech/Pfizer û Spikevax® ji Moderna)

Ji 14-ê Çile ya 2022-an (Ev belgeya agahdariyê bi domdarî tê nûve kirin)

AUFKLÄRUNGSMERKBLATT

Zur Schutzimpfung gegen COVID-19 (Corona Virus Disease 2019) (Grundimmunisierung und Auffrischimpfung)

– mit mRNA-Impfstoffen –

(Comirnaty® 10 µg und 30 µg von BioNTech/Pfizer und Spikevax® von Moderna)

Stand: 14. Januar 2022 (dieser Aufklärungsbogen wird laufend aktualisiert)

Nîşanên COVID-19 çi ne?

Nîşaneyên berbiçavê yên COVID-19 pêk tên ji kuxika hişk, ta, bêhna tengî, û her weha windabûna bîhn û tamê ya demkî. Hesta nexweşiya giştî ku bi serê û êşa endaman, êşa qirikê, û avrêja pozê jî herwisa hatîye dîtin. Pirsgirêkên xwarin mehandinê, werimîna multehim, û werimîna girêkên lîmfî gelek kêr hatine rapor kirin. Gengaz e ku paşê zîrê bigihîje rehikan an pergala dil-demar û her weha domandina nexweşiyê. Her çend nexweşî bi giştî sivik e û piraniya nexweşan bi tevahî baş dibin, lê tîrsa bûyerên giran ên nexweşiyê, ji bo nimûne nexweşiya sihan ku dibe sedema mirinê jî heye. Bi taybetî zarok û nûciwan, bi giştî demên wan ên sivik ên nexweşiyê hene. Di wan de rewşa giran kêr e û bi giştî bi şertên berê re çêdibin. Maweyên dijwar û bandorên neyînî bi giştî di jinên ducanî de kêr in, her çend ducanî bixwe ji bo maweyên giran ên COVID-19 faktorek xetereyê ye. Kesên ku bi kêmasiya parêzbandiyê re ne, dibe ku maweyên wan a nexweşiyê girantir hebe û ji bo maweyên xeternak jî maweyên kûjer hebe.

Was sind die Symptome von COVID-19?

Zu den häufigen Krankheitszeichen von COVID-19 zählen trockener Husten, Fieber, Atemnot sowie ein vorübergehender Verlust des Geruchs- und Geschmackssinnes. Auch ein allgemeines Krankheitsgefühl mit Kopf- und Gliederschmerzen, Halsschmerzen und Schnupfen wird beschrieben. Seltener wird über Magen-Darm-Beschwerden, Bindehautentzündung und Lymphknotenschwellungen berichtet. Folgeschäden am Nerven- oder Herz-Kreislaufsystem sowie langanhaltende Krankheitsverläufe sind möglich. Obwohl ein milder Verlauf der Krankheit häufig ist und die meisten Erkrankten vollständig genesen, kommen auch schwere Verläufe beispielsweise mit Lungenentzündung vor, die zum Tod führen können. Insbesondere Kinder und Jugendliche haben zumeist milde Krankheitsverläufe; schwere Verläufe sind in bei ihnen selten und kommen meist bei bestehenden Vorerkrankungen vor. Bei Schwangeren sind schwere COVID-19-Verläufe und Komplikationen insgesamt selten, jedoch stellt die Schwangerschaft an sich einen relevanten Risikofaktor für schwere Verläufe dar. Personen mit Immunschwäche können einen schwereren Krankheitsverlauf und ein höheres Risiko für einen tödlichen Verlauf haben.

Kîjan vaksîn tên bikar anîn?

Vakslêdanên erêbûyîyê niha, Comirnaty® 10 µg (ji bo zarokên 5 heta 11 salî) Comirnaty® 30 µg (ji bo kesên 12 salî û mezintir) ji BioNTech/Pfizer û Spikevax® ji Moderna, vakslêdanên li ser mRNA yê li ser bingeha heman teknolojiyê ava bûne.

Vaksîna mRNA pêk tê ji "nexşeya avakirinê" (bilûpirînt) ji bo hêmanek yekane ji vîrusê (proteîna oşî tê gotin), lê di nava çî vîrusên vaksînan de yên dûbare bûyî tune ne. Ji ber vê yekê vaksîn nikare bibe sedema nexweşiyê di kesên vaksînebûyî de. herwusa kesên vaksînkirî nikarin vîrusê derbasî kesên din bikin.

mRNA heyî di vaksînan de piştî vaksîne kirinê bi genoma mirovan de tevhev nabe, lê piştî çend rojan di laş piştî têketina nava şaneyan "tên xwendin", ku di encamê de şaneyên proteînên oşiyên xwe berhem dikin, proteînên oşî ku bi wî awayî ji aliyê leşê kesê vaksînebûyî tê berhem kirin, ji aliyê pergala parastina leşî wekî proteînên biyanî nas dike, di encamê de antîbodî û şaneyên parastinê li dijî proteîn oşiya vîrusê çê dibin. Ev rewş bersivê ewleh ya parastinê diafirîne. mRNA –ya heyî di caksînê de piştî çend rojan di laş de tê tîk birin. Wê gavê, proteîna oşî êdî nayê hilberandin.

Was sind mRNA-COVID-19-Impfstoffe?

Bei den derzeit zugelassenen Impfstoffen Comirnaty® 10 µg (für Kinder zwischen 5 und 11 Jahren) und Comirnaty® 30 µg (für Personen ab 12 Jahren) von BioNTech/Pfizer sowie Spikevax® von Moderna handelt es sich um mRNA-basierte Impfstoffe, die auf der gleichen Technologie beruhen.

Die mRNA-Impfstoffe enthalten eine „Bauanleitung“ für einen einzigen Baustein des Virus (das sogenannte Spikeprotein), aber keine vermehrungsfähigen Impfviren. Deshalb können die Impfstoffe die Erkrankung beim Geimpften nicht auslösen. Geimpfte können auch keine Impfviren auf andere Personen übertragen.

Die in den Impfstoffen enthaltene mRNA wird nach der Impfung nicht ins menschliche Erbgut eingebaut, sondern nach Eintritt in die Zellen „abgelesen“, woraufhin diese Zellen dann das Spikeprotein selbst herstellen. Die so vom Körper des Geimpften gebildeten Spikeproteine werden vom Immunsystem als Fremdeiwisse erkannt; in der Folge werden Antikörper und Abwehrzellen gegen das Spikeprotein des Virus gebildet. So entsteht eine schützende Immunantwort. Die im Impfstoff enthaltene mRNA wird im Körper nach einigen Tagen abgebaut. Dann wird auch kein Viruseiweiß (Spikeprotein) mehr hergestellt.

Kîjan vaksîn wek beşek ji parêzbendiya seretayî çawa tê lêdayin?

Vaksîn di masûlkeya milê jorîn de tê lêdayin. Ji bo parêzbendiya seretayî pêdivî ye ku du car di navberên 3 heta 6 hefte ji bo (Comirnaty®) an jî 4 heta 6 hefte ji bo (Spikevax®) de were lêdayin. Ji bo hemî vaksînên parêzbendiya seretayî bi vaksîna mRNA,, dibê ku vaksînelêdana çêkerî be. Helbet veqetandek ji bo kesên di bin 30 salî de û jinên ducanî yê ku vaksîna Spikevax® di dema vaksînelêdayina xwe ya yekim de wergirtine. Li gorî STIKO, vaksînelêdanên mayî divê bi Comirnaty® re bêne dayîn, ji ber ku nîşan hene ku mirovên di bin 30 salî de piştî ku bi Spikevax® vaksîn dibin ihtîmala tûşîbûna ji myokarditis û perikarditis li hember Comirnaty® zêdetir in. Wekî din, eger vaksîna mRNA ya ku ji bo doza yekem a vaksînê tê bikar anîn tune be, vaksîna mRNA ya din dikare li gorî berçavgrtina sînoren temenî û di jinên ne ducanî de were bikar anîn.

Parêzbendiya seretayî piştî biştrastbûna tûşîbûnê:

Kesên vaksînebûyî tûşî enfeksiyona SARS-CoV-2-ya îbatkirî divê ji bo parêzbendiya seretayî tenê dozek vaksînê di navberek herî kêr 3 mehan ji tûşîbûnê de werbigirin ku ji aliyê STIKO ve tê pêşniyar kirin (bi şerta ku kêmasiya parêzbendiya wan tune be. Di rewşên weha de, besbûna vaksîneyek yekane dê li gorî her dozê were destnîşankirin.) Kesên ku di nav 4 hefte ji vaksînekirina berê de piştî vaksîneya yekem a enfeksiyonek SARS-CoV-2 ya îbatkirî hebûne, divê doza duyemîna vaksînê bistînin. Eger enfeksiyona SARS-CoV-2 bi navberka 4 hefte an jî zêdetir ji vaksînekirina 1 dozî ya berê çê bibe, ji bo parêzbendiya destpêkî ne hewce ye ku vaksînekirinek din were kirin.

Kêrhatîkirina parastina vaksînê piştî vaksînekirina destpêkê bi vaksîna Janssen® COVID-19 (ji Johnson & Johnson):

Kesên ku dozek vaksîna Janssen® COVID-19 wergirtine divê dozek ji vaksînek zêde ya mRNA werbigirin da ku parastina vaksîna xwe kêrhatî bikin. Ji wan kesan re doza vaksîna mRNA (Comirnaty® ji bo kesên di bin 30 salî de, Comirnaty® an Spikevax® ji bo kesên 30 salî û mezintir) ku li gorî pêşniyara STIKO parastina vaksîna xwe bi navberek herî kêr 4 hefte ji yekem doza wan a vaksînê kêrhatî bikin.

Vaksînelêdana COVID-19 hevdem gel vaksînelêdanên din:

Li gorî STIKO, vaksîna COVID-19 dikare hevdem bi vaksînên neçalakkirî wekî vaksîna grîpê were lêdayîn. Di vê rewşê de divê were zanîn ku bertekên vaksînelêdanê hinekî ji yek vaksîna ku bi tenê tê bikar anîn, zêdetir e. Dema ku vaksînên cûda hevdem têne dayîn, bi giştî pêdivî ye ku vaksîne li organên cûda were lêdayin. Berî û piştî her vaksînelêdana COVID-19 divê herî kêr 14 roj ji vaksînelêdanên din ên zindî dûr bibin.

Lêdayina Comirnaty® 10 µg (10 mîkrogram/doze) ji bo zarokên 5 heta 11 salî:

Vaksîna Comirnaty® 10 µg du caran di navberên 3 heta 6 hefteyan de ji bo parêzbendiya destpêkî tê lêdayîn.

Wie wird welcher Impfstoff im Rahmen der Grundimmunisierung verabreicht?

Der Impfstoff wird in den Oberarmmuskel gespritzt. Zur Grundimmunisierung muss der Impfstoff zweimal im Abstand von 3 bis 6 Wochen (Comirnaty®) bzw. 4 bis 6 Wochen (Spikevax®) verabreicht werden. Bei allen Impfungen der Grundimmunisierung mit einem mRNA-Impfstoff sollte der gleiche Impfstoff desselben Herstellers verwendet werden. Eine Ausnahme besteht jedoch bei Personen unter 30 Jahren und bei Schwangeren, die bei der ersten Impfung Spikevax® erhalten haben. Die noch ausstehenden Impfungen sollen laut STIKO mit Comirnaty® erfolgen, da es Hinweise gibt, dass bei unter 30-Jährigen das Risiko des Auftretens einer Herzmuskel- und Herzbeutelentzündung nach Impfung mit Spikevax® höher ist als mit Comirnaty®. Darüber hinaus kann, wenn der für die 1. Impfstoffdosis verwendete mRNA-Impfstoff nicht verfügbar ist, unter Berücksichtigung der Alterseinschränkung und bei Nichtschwangeren auch der jeweils andere mRNA-Impfstoff eingesetzt werden.

Grundimmunisierung nach nachgewiesener Infektion:

Ungeimpfte Personen mit nachgewiesener SARS-CoV-2-Infektion erhalten zur Grundimmunisierung entsprechend der Empfehlung der STIKO lediglich eine Impfstoffdosis mit einem Abstand von mindestens 3 Monaten zur Infektion (sofern bei ihnen keine Immunschwäche vorliegt. In diesen Fällen wird im Einzelfall entschieden, ob die einmalige Impfung ausreichend ist.).

Personen, die nach der 1. Impfstoffdosis eine gesicherte SARS-CoV-2-Infektion im Abstand von unter 4 Wochen zur vorangegangenen Impfung hatten, erhalten eine 2. Impfstoffdosis mit einem Abstand von mindestens 3 Monaten zur Infektion. Ist die SARS-CoV-2-Infektion in einem Abstand von 4 oder mehr Wochen zur vorangegangenen 1-maligen Impfung aufgetreten, ist keine weitere Impfung zur Grundimmunisierung notwendig.

Optimierung des Impfschutzes nach einer Grundimmunisierung mit COVID-19 Vaccine Janssen® (von Johnson & Johnson):

Personen, die eine Impfstoffdosis COVID-19 Vaccine Janssen® erhalten haben, sollen zur Optimierung ihres Impfschutzes entsprechend der STIKO-Empfehlung eine weitere Impfstoffdosis eines mRNA-Impfstoffs (für Personen unter 30 Jahren Comirnaty®, für Personen ab 30 Jahren Comirnaty® oder Spikevax®) mit einem Mindestabstand von 4 Wochen zur ersten Impfstoffdosis erhalten.

COVID-19-Impfung gleichzeitig mit anderen Impfungen:

Gemäß STIKO können COVID-19-Impfungen mit anderen Totimpfstoffen wie beispielsweise Grippeimpfstoffen gleichzeitig verabreicht werden. In diesem Fall können Impfreaktionen etwas häufiger auftreten als bei der zeitlich getrennten Gabe. Bei der gleichzeitigen Verabreichung verschiedener Impfungen sollen die Injektionen in der Regel an unterschiedlichen Gliedmaßen erfolgen. Zu anderen Impfungen mit Lebendimpfstoffen soll ein Abstand von mindestens 14 Tagen vor und nach jeder COVID-19-Impfung eingehalten werden.

Verabreichung von Comirnaty® 10 µg (10 Mikrogramm/Dosis) bei Kindern von 5 bis 11 Jahren:

Der Impfstoff Comirnaty® 10 µg wird zur Grundimmunisierung zweimal im Abstand von 3 bis 6 Wochen verabreicht.

Pêvajoya vaksînelêdanên bihêzker çawa ye

STIKO vaksînelêdana bihêzker bi vaksîna mRNA ji bo hemû kesên 12 salî û mezintir bi navbera 3 meh piştî doza vaksîna parêzbendiya destpêkî ya dawîn pêşniyar dike. Di heman demê de kesên ku carekê bi vaksîna Covid-19 Johnson vaksîne bûne û vaksîna mRNA wekî doza duyemîn a vaksîne werdigirin, ji bo ku parêzbendiya seretaî baştir bikin, tê pêşniyar kirin ku vaksîna bihêzker digel vaksîna mRNA 3 meh piştî doza berê ya vaksîne were dayîn.

Eger gengaz be, divê Vaksînelêdana mRNA ku ji bo vaksînelêdana bingehîn tê bikar anîn were bikar anîn. Eger ev berdest nebe, dibe ku vaksînelêdana mRNA ya din were bikar anîn.

Kesên tûşî SARS-CoV-2 bûne û dûv re 1 doz ji vaksînê wergirtine, bi di navberek herî kêmtir 3 meh piştî parêzbendiya seretayî pêdivî ye ku bihêzkerê bistînin.

Kesên ku piştî vaksîna Covid-19 tûşî enfeksiyona SARS-CoV-2 bûne (bêy berçavgirtina hejmara dozên vaksînê) jî divê bi kêmanî 3 meh piştî enfeksiyonê vaksîna bihêzker bistînin.

Kesên ku di demek kurt de (kêmtirî 4 hefte) piştî vaksînebûna 1-ê tûşî enfeksiyona SARS-CoV-2 bûne û dûv re wekî beşek ji parêzbendiya destpêkî, hatine vaksîne kirin, divê bi kêmanî 3 meh ji vaksînebûna berê, vaksîna bihêzker bistînin.

Ji bo jinên ducanî, STIKO vaksînekirina bihêztir ji sêmeha duyemîn bi vaksîna mRNA Comirnaty® pêşniyar dike.

Ji bo kesên di bin 30 salî, tenê Comirnaty® tê pêşniyar kirin, Ji bo kesên 30 salî û mezintir, her du vaksînê mRNA yên berdest (Comirnaty® û Spikevax®) wekhev kêrhatî ne.

Wie ist mit Auffrischimpfungen zu verfahren?

Die STIKO empfiehlt [allen Personen ab 12 Jahren](#) eine Auffrischimpfung mit einem mRNA-Impfstoff – in einem Abstand von mindestens 3 Monaten zur letzten Impfstoffdosis der Grundimmunisierung. Auch Personen, die eine einmalige Impfung mit COVID-19 Vaccine Janssen erhalten und zur Optimierung der Grundimmunisierung als 2. Impfstoffdosis einen mRNA-Impfstoff bekommen haben, wird eine Auffrischimpfung mit einem mRNA-Impfstoff im Abstand von 3 Monaten zur vorangegangenen Impfstoffdosis empfohlen.

Es soll möglichst der mRNA-Impfstoff benutzt werden, der im Rahmen der Grundimmunisierung genutzt wurde. Wenn dieser nicht verfügbar ist, kann auch der jeweils andere mRNA-Impfstoff eingesetzt werden.

Personen, die eine SARS-CoV-2-Infektion durchgemacht und danach 1 Impfstoffdosis erhalten haben, sollen in einem Abstand von mindestens 3 Monaten nach der Impfung der Grundimmunisierung eine Auffrischimpfung erhalten.

Personen, die nach COVID-19-Impfung (unabhängig von der Anzahl der Impfstoffdosen) eine SARS-CoV-2-Infektion durchgemacht haben, sollen im Abstand von mindestens 3 Monaten nach Infektion ebenfalls eine Auffrischungsimpfung erhalten.

Personen, die kurz (unter 4 Wochen) nach der 1. Impfung eine SARS-CoV-2-Infektion durchgemacht haben und dann noch 1-mal im Rahmen der Grundimmunisierung geimpft wurden, sollen ebenfalls im Abstand von mindestens 3 Monaten zur vorangegangenen Impfung eine Auffrischimpfung erhalten.

Schwangeren empfiehlt die STIKO eine Auffrischimpfung ab dem 2. Trimenon mit dem mRNA-Impfstoff Comirnaty®.

Für Personen unter 30 Jahren wird ausschließlich der Einsatz von Comirnaty® empfohlen. Für Personen im Alter ab 30 Jahren sind beide derzeit verfügbaren mRNA-Impfstoffe (Comirnaty® und Spikevax®) gleichermaßen geeignet.

Vaksînekirin çiqas bibandor e?

Vaksînelêdanên COVID-19 mRNA-yên berdest di warê bandor û hem jî bertekan yekreng in.

Li gorî zanîna heyî, vaksîneyên tam bi vaksînên mRNA pir bi bandor e. Di lêkolînan de, yê li ser parastina li hember guhertoya Delts, bandorek nêzik ji sedî 90% ji pêşîlêgirtina nexweşiya giran destnîşan dike ; Parastina li hember maweyên nexweşiya sivik bi vaksînelêdanên mRNA yên berdest kêmtir e. Bi gotinek din eger kesek ku tam bi vaksînek mRNA re vaksîne bûye bi patojenek re têkeve têkiliyê, bi gengaziyek zêde ew nexweşê giran nabe. Vêga nayê zanîn ku dê vaksîn çiqas dom bike, û gelo kesa/êvaksînbûyî dikarin vîrusê belav bike yan na. Daneyên pêşîn ên li ser bandora parastinê ya li dijî cureya Omicron li gorî cureya Delta kêmtir bandorek nîşan dide. Lêbelê, piştî rêveberiya vaksîna bihêzker, bandorek parastinê ya girîng li dijî enfeksiyona nîşankirî û nexweşiya giran a Omicron-ê hate dîtin.

Vaksînekirina zarok û nûciwanên di navbera 12 û 17 salî:

Di ceribandînan klînîkî de, vaksîneya ducarî bi Comirnaty® re li zarokên 12 heta 15 salî û bi Spikevax® di zarokên 12 heta 17 salî, %100 bandor nîşan da. Ji bo herdu vaksînê mRNA jî pêdivî ye ku em bifikirin ku bandora li ser nexweşiyek giran a COVID-19 jî bi heman rengî ye.

Vaksîneya zarokên 5 heta 11 salî:

Di ceribandîna klînîkî de li zarokên di navbera 5 û 11 salî de, 91% bandorkeriya pêşîlêgirtina nexweşîya Covid-19 piştî vaksîneya tam bi Comirnaty® 10 µg re hate destnîşankirin.

Wie wirksam ist die Impfung?

Die verfügbaren COVID-19-mRNA-Impfstoffe sind hinsichtlich der Wirksamkeit vergleichbar.

Nach derzeitigem Kenntnisstand bietet eine vollständige Impfung mit mRNA-Impfstoffen eine hohe Wirksamkeit: Studien, die den Schutz gegenüber der Delta-Variante untersuchten, zeigen eine Wirksamkeit von etwa 90 % bezüglich der Verhinderung einer schweren Erkrankung; der Schutz vor milden Krankheitsverläufen liegt bei den verfügbaren mRNA-Impfstoffen niedriger. Das bedeutet: Wenn eine mit einem mRNA-Impfstoff vollständig geimpfte Person mit dem Erreger in Kontakt kommt, wird sie mit hoher Wahrscheinlichkeit nicht schwer erkranken. Erste Daten bezüglich der Schutzwirkung vor der Omikron-Variante zeigen eine geringere Wirksamkeit im Vergleich zur Delta-Variante. Nach Verabreichung einer Auffrischimpfung wurde jedoch eine erheblich verbesserte Schutzwirkung gegenüber einer symptomatischen Infektion und schweren Erkrankung mit der Omikron-Variante festgestellt.

Impfung von Kindern und Jugendlichen zwischen 12 und 17 Jahren:

In klinischen Studien zeigte eine zweimalige Impfung mit Comirnaty® bei 12- bis 15- Jährigen bzw. mit Spikevax® bei 12- bis 17-Jährigen eine Wirksamkeit gegenüber einer COVID-19-Erkrankung von bis zu 100 %. Bei den mRNA-Impfstoffen ist davon auszugehen, dass die Wirksamkeit in Bezug auf eine schwere COVID-19-Erkrankung ähnlich hoch ist.

Impfung von Kindern zwischen 5 und 11 Jahren:

In der klinischen Studie mit Kindern zwischen 5 und 11 Jahren wurde eine Wirksamkeit von 91 % bezüglich der Verhinderung einer COVID-19-Erkrankung nach vollständiger Impfung mit Comirnaty® 10 µg ermittelt.

Dibe kî li dijî COVID-19 bi vaksîna mRNA were vaksîn kirin?

Comirnaty® 30 µg û Spikevax® ji bo kesên 12 salî û mezintir re hatiye piştrast kirin. Wekî din, sertîfîkaya Comirnaty® ji bo kesên di navbera 5 û 11 salî de (Comirnaty® 10 µg) tê domandin.

STIKO vaksîneya li dijî COVID-19 ji bo hemû kesên 12 salî û mezin re pêşniyar dike.

STIKO wekî ku ji bo ev koma temenî hatiye erê kirin, ew parêzbendiya destpêkî bi Comirnaty® 10 µg ji bo zarokên di navbera 5 û 11 salî de û bi şert û mercên berê re pêşniyar dike. Vaksîna Covid-19 her weha bêyî şert û mercên pêşîn li ser daxwaziya kesane ya zarok û dêûbav an sergêrî piştî erêkirina bijîşkî dikare ji zarokên 5 heya 11 salî re were lêdayîn. Wekî din, vaksîna ji bo zarokên 5 heta 11 salî tê pêşniyar kirin eger ku xizm an kesên din di xetereya nexweşîya giran a Covid-19 de bin, û ew bi xwe nikaribin vaksîne bistînin, an jî gumana maqûl heye ku eger ew werin vaksîne kirin jî parastina kêrhatî bidest naynin (ji bo mînak, kesên ku di bin dermankirina tepisandina pergala ewlehiya leşî de ne). Zarokên ji 5 heta 11 salî bi enfeksiyonek SARS-CoV-2 ya ku berê hatiye diyar kirin divê doza vaksîne bi qasî 3 mehan piştî enfeksiyona SARS-CoV-2 bistînin. Zarokên bêy şert û mercên berê yê tûşîbûna ji enfeksiyona SARS-CoV-2 re ji aliyê laboratîfê erê bûye, divê di vê demê de neyên vaksîne kirin.

Ji bo kesên di bin 30 salî de, hem vaksîna destpêkî û hem jî vaksîna bihêzker ên potansiyel divê bi taybetî bi Comirnaty re bêne lêdayin. Ji ber ku piştî vaksînelêdana bi Spikevax re li gorî vaksînelêdana bi Comirnaty®, şahidî li ser xetera zêde ya myocarditis û pericarditis li kesên di bin 30 salî de heye. STIKO pêşniyar dike ku kesên 30 salî û mezintir bi Comirnaty® û Spikevax® vaksînelêdanê bibin.

Divê jinên ducanî ji sêmeha duyemîn bêyî ku temenê wan were berçav girtin, bi Comirnaty® werin vaksîne kirin, her çend daneyên berawirdî yê Comirnaty® û Spikevax® ji bo jinên ducanî tune be. Comirnaty® herwusa parastinek baş li hember nexweşîya COVID-19 di jinên ducanî de radest dike. Heya nuha, ne diyar e ka vaksînekirina jinek ducanî dikare zarokî biparêze. STIKO herwusa vaksînekirina bi vaksîna mRNA ji bo jinên şîrdanê, û bi vaksîna Comirnaty® ji bo jinên şîrdanê yê di

bin 30 salî de jî pêşniyar dike. Ti delîl tune ku vaksînekirina COVID-19 di dema şîrdanê de xetereyek ji bo dayik an zarokî çêdike.

Wer sollte mit welchem mRNA-Impfstoff gegen COVID-19 geimpft werden?

Comirnaty® 30 µg und Spikevax® sind für Personen ab 12 Jahren zugelassen. Zudem ist die Zulassung von Comirnaty® für Personen zwischen 5 und 11 Jahren erweitert worden (Comirnaty® 10 µg).

Die STIKO empfiehlt die Impfung gegen COVID-19 allen Personen ab 12 Jahren.

Die STIKO empfiehlt Kindern, die zwischen 5 und 11 Jahren alt sind und Vorerkrankungen haben, eine Grundimmunisierung mit Comirnaty® 10 µg gemäß der Zulassung für diese Altersgruppe. Die COVID-19-Impfung kann auch bei 5- bis 11-jährigen Kindern ohne Vorerkrankungen bei individuellem Wunsch von Kindern und Eltern bzw. Sorgeberechtigten nach ärztlicher Aufklärung erfolgen. Zusätzlich wird die Impfung für 5- bis 11-jährige Kinder empfohlen, in deren Umfeld sich Angehörige oder andere Kontaktpersonen mit hohem Risiko für einen schweren COVID-19-Verlauf befinden, die selbst nicht geimpft werden können oder bei denen der begründete Verdacht besteht, dass die Impfung nicht zu einem ausreichenden Schutz führt (z. B. Menschen unter immunsuppressiver Therapie).

5- bis 11-jährige Kinder mit einer Vorerkrankung, die bereits eine labordiagnostisch gesicherte SARS-CoV-2-Infektion durchgemacht haben, sollen eine Impfstoffdosis im Abstand von etwa 3 Monaten zur SARS-CoV-2-Infektion erhalten.

Kinder ohne Vorerkrankungen, die bereits eine labordiagnostisch gesicherte SARS-CoV-2-Infektion durchgemacht haben, sollen vorerst nicht geimpft werden.

Bei Personen unter 30 Jahren sollen sowohl die Grundimmunisierung als auch mögliche Auffrischimpfungen ausschließlich mit Comirnaty® durchgeführt werden. Grund dafür ist, dass es Hinweise für ein höheres Risiko für eine Herzmuskel- und Herzbeutelentzündung (Myokarditis und Perikarditis) bei Personen unter 30 Jahren nach Impfung mit Spikevax® im Vergleich zu einer Impfung mit Comirnaty® gibt. Personen, die 30 Jahre und älter sind, können nach Empfehlung der STIKO sowohl mit Comirnaty® als auch mit Spikevax® geimpft werden.

Schwangere sollen ab dem 2. Schwangerschaftsdrittel ungeachtet ihres Alters mit Comirnaty® geimpft werden, auch wenn für Schwangere keine vergleichenden Daten für Comirnaty® und Spikevax® vorliegen. Comirnaty® schützt auch in der Schwangerschaft sehr gut vor einer COVID-19-Erkrankung. Schwere Nebenwirkungen kommen laut aktueller Studienlage nach der Impfung in der Schwangerschaft nicht gehäuft vor. Ob durch die Impfung der Schwangeren auch ein Schutz für das Neugeborene erzielt werden kann, ist derzeit nicht klar. Die STIKO empfiehlt Stillenden ebenfalls die Impfung mit mRNA-Impfstoffen, bei Stillenden unter 30 Jahren mit dem Impfstoff Comirnaty®. Es gibt keine Hinweise, dass die COVID-19-Impfung während der Stillzeit ein Risiko für Mutter oder Kind darstellt.

Ji bo kî nabe vaksîne were lêdayin?

Kesên tûşî nexweşiyek çalak a bi tayê (38,5° C û jortir), dibe tenê piştî başbûnê werin vaksîne kirin. Lêbelê, sirlêdayin an taya hinekî bilind (bin 38,5 ° C) nabe sedem ku vaksîne dereng bikeve. Kesên ku ji yek ji madeyên pêkhînerê vaksînekirinê re alerjiya giran hene, nabe werin vaksîne kirinê, ji kerema xwe berî vaksînekirinê doktorê xwe re bêjin. Kesa/ê ku piştî vaksînekirina yekem bertekek alerjîka yekser hebe (anafilaksî), nabe vaksîna 2yemîn bistîne.

Wer soll nicht geimpft werden?

Wer an einer akuten Krankheit mit Fieber (38,5 °C oder höher) leidet, soll erst nach Genesung geimpft werden. Eine Erkältung oder gering erhöhte Temperatur (unter 38,5 °C) sind jedoch kein Grund zur Verschiebung. Bei einer Überempfindlichkeit gegenüber einem Impfstoffbestandteil sollte nicht geimpft werden: Bitte teilen Sie der Ärztin/dem Arzt vor der Impfung mit, wenn Sie Allergien haben. Wer nach der 1. Impfung eine allergische Sofortreaktion (Anaphylaxie) hatte, sollte die 2. Impfung nicht erhalten.

Berî û paşîya vaksînelêdanê divê ez çi bikim?

Eger we piştî vaksînelêdana berê an vaksînek din hişê xwe winda kiribe, gengaziya tûşîbûna we ji alerjiya yekser hebe an reaksiyonên weyên din hebin, ji kerema xwe doktorên xwe agahdar bikin. Di vê rewşê de, ew dikare piştî vaksînekirinê ji bo demek dirêj çavdêriyê we bike.

Berî vaksîne kirinê eger we nexweşiyek meyînê heye an hûn dermanê dijî meyînê dixwînin ji kerema xwe doktorê xwe agahdar bikin. Hûn dikarin bi tedbîrên hêsan bêne vaksîne kirin. Eger alerjîk yan di

dema borî de we bertekên alerjî hebin, ji kerema xwe berî ku hûn vaksîne bibin ji doktorê xwe re bêjin. Doktorê we dê ji we re bêje ka sedemek heye ku hûn vaksîne bikin yan nekin.

Di roja yekem piştî vaksînelêdanê de, ji stresa fizîkî ya giran û werzîşa pêşbazî dûr bisekinin. Eger piştî vaksînekirinê êş an taya we hebe, dibe ku dermanek aramker/ taybir were bikar anîn. Hûn dikarin li ser vê yekê doktorên xwe re biaxivin.

Ji kerema xwe agadar bin ku parastin yekser piştî vaksînê dest pê nake û ji bo hemî kesên vaksînebûyî ne wek yek e. Wekî din, kesên vaksînelêdandî dikarin vîrusê (SARS-CoV-2) bêyî ku nexweş bibin belav bikin, her çend metirsî li gorî kesên nevaksînekirî pir kêmtir dibe. Ji ber vê yekê, ji kerema xwe qaîdeyên AHA + L bişopînin.

Wie verhalte ich mich vor und nach der Impfung?

Wenn Sie nach einer früheren Impfung oder anderen Spritze ohnmächtig geworden sind, zu Sofortallergien neigen oder andere Reaktionen hatten, teilen Sie dies bitte der Ärztin/dem Arzt vor der Impfung mit. Dann kann sie/er Sie nach der Impfung gegebenenfalls länger beobachten.

Informieren Sie bitte die Ärztin/den Arzt vor der Impfung, wenn Sie an einer Gerinnungsstörung leiden oder gerinnungshemmende Medikamente einnehmen. Sie können unter Einhaltung einfacher Vorsichtsmaßnahmen geimpft werden. Teilen Sie bitte auch mit, wenn Sie nach einer Impfung in der Vergangenheit eine allergische Reaktion hatten oder Allergien haben. Die Ärztin/der Arzt wird mit Ihnen abklären, ob etwas gegen die Impfung spricht.

In den ersten Tagen nach der Impfung sollten außergewöhnliche körperliche Belastungen und Leistungssport vermieden werden. Bei Schmerzen oder Fieber nach der Impfung können schmerzlindernde/ fiebersenkende Medikamente eingenommen werden. Ihre Ärztin/Ihr Arzt kann Sie hierzu beraten.

Bitte beachten Sie, dass der Schutz nicht sofort nach der Impfung einsetzt und auch nicht bei allen geimpften Personen gleichermaßen vorhanden ist. Zudem können geimpfte Personen das Virus (SARS-CoV-2) ohne Erkrankung weiterverbreiten, auch wenn das Risiko im Vergleich zu ungeimpften Personen deutlich vermindert ist. Bitte beachten Sie deshalb weiterhin die AHA + L-Regeln.

Çi cûre bertek piştî ku vaksînekirin pêk tê, çêdibe?

